Cejna Sersalê li Çiyayê Kurmênc

Li ba bawermendên ola Êzdî, Çarşema serê meha Nîsana Şerqî cejna Sersalê ye. Ew bi Çarşema Sor jî bi nav dibe. Wek dibêjin, di wê rojê de Tawisî Melek dadikeve erdê û li halê Êzdiyan dipirse. Pişt wê rojê her gundek bi serê xwe diçû ber pîrozga gundê xwe, qurban dikirin, xwarin çê dikirin û ahengên bi def û dîlan lidar dixistin.

Di van sî çel salên dawî de, şabûneka boneya cejna Sersalê hema hema vemirtibû, lê li van çend salên dawî, ji nû ve tê bibîr anîn û rêwresmên wê li dar dikevin.

Berê vê bi çend salan, hinek Êzdî dest pê kirin û her sala diçûn ber pîrozgeha Şêx Berkêt, ta li van du salên dawî bi sedan Kurdên Êzdî û ne Êzdî jî li ew boneya pîroz kom dibûn û şahî li dar dixistin.

Îsal, sala 2006 an, ji ber ku pozê çiyayê Şêx Berkêt bibû baregeheke leşkerî, şahiyên mezin li dora pîrozgehê hatin qedexekirin. Ji lewre jî şêniyê ku çûbû Sersalê li çend cihan belav bûn. Lê hejmara bilind li ber girê Endarê şahiyên xwe kirin û cejn pîroz kirin.

Bi gelemperî cejn û aheng cihê vehesiya hemî beşdaran bû, çi Êzdî û çi ne Êzdî, çinkî, ji bilî ku ew li Êzdiyan rojeke pîroz e, ew perçake ji dêrok û kelepûra gelê Kurd e jî. Em pir girîng dibînin ku were parastin û li dar xistin.

Em hemî Kurdan bi boneya cejna Sersala ola Êzdî pîroz dikin, û hêvîdar in ku sala tê ji ya çûyî xweştir be û armancên her kesên bindest pêk werin.

Newroza Helebê

li bajarê Helebê , bi sedhezaran bi def û dîlan , reqis û seman çepik û lîliyan kêf û şadî û bi cilên rengîn , ji bajêr derketin û NEWROZa aştî , azadî û wekheviyê rengarengî kirin û pê şabûn, ji dost dijminan re diyarkirin ku, gelê Kurd û Newroz hertim li cî ye û tu hêz nikare wê ji rêça wê ya rast derîne . Ji bîr nebe jî gelek mîvanên **ragihandina şamê** jî bi kêf , xweşî û pîrozbahî lê beşdar bûn .Mîna 1-Şalyrê berê Ebdimecîd Mencûnê 2- Evokat Îbrahêm Melkî 3-Umer Qeşaş 4- Evokat Necîb Dedem û hinekdin.

"komîta rêdekisyona weşana Newrozê bi bûneya cejna Newrozê, gelê xwe û gelên cîran pîroz dike û xêr xweşiyê ji tevan re dixwaze. "

****

*-**Li** 20an êvarî , cara yekem avokatên me yên Kurd dikarin rêdaneke fermî ji parêzvanê Helebê , ji bo lidarxistina şahiya Newrozê li Nadî Elirobe bistînin . Û di siya wê rêdenê de , bi beşdariya dor 400kes , (di nav de hin mîvanên Ereb) û alîkariya tîpên folklorî (mîna Zozan) û hinde stiranbêjan, sersala Newrozê bi stiran , dîlan , çapik û reqis ta berdestê sibê borandin.

*-Rêxistina P.Y.D.Ks li bajarê Helebê li 20 û 21an 8500 kartên pîrozbahiyê yên xweşik û rengerengî li xelkê me belav kirin û bi wê awayî gelê xwe pîroz kir.